

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Hejmar (161) Sal 31 16 Tîrmeh 2026 z - 2638 k Êmêl : Newroz@yek-dem.net

69 SAL, Ji temenê tevgerê, Serkeftin... Likumandin û têkçûn!





Desteya sernivîser

Di dîroka gelê Kurd li Sûriyê de, Roja 14.06.1957-an, rojeke bi nîşan û dîrokî ye. Di wê roja pîroz de, li bajarê Helebê, û li mala xebatkarê Kurd Mihemed Elî Xoce, civînek lidar ket, û biryara damezirandina yekemîn partiya siyasî Kurdî li Sûriyê hate wergirtin. Beşdarên wê civînê jî ev bûn:

Osman Sebrî- Mihemed Elî Xoce, Reşîd Hemo- Şewket Nesan - Ebdulhemîd Derwîş û Hemze Nuwêran, Xelîl Mihemed Ebdella bûn.

Ji ber zor û sitema detshilata şoven li dijî hebûna miletê Kurd li Sûriyê, pêwistiyek bi rêxistineke rêzanî ya Kurdî hebûye, da ku ew rêxistin hêz û xebata Kurdan komserhev bike û berevaniyê di ber hebûn û mafên wî yên netewî de bike, ziman, çand û kultûra wî biparêze.

Li ber vedenga damezirandina Partiyê li ser destê xebatkar û çalakvanên Kurd, bi 2

Gotinek di 100 Saliya Qamişlo; Bajarê Evînê de

Konê Reş



Qamişlo ev bajarê ku hunermend Seîd Yûsiv bi navê Bajarê Evînê bi nav kiriye, bi hunera xelkên xwe ji Cuhû, Siryan, Ermen, Kurd û Ereban ve hatiye avakirin. Dergehê xwe zû bi zû ji xelkê re venake. Îro, piştî 100 salî ji avakirinê, gelek wêneyên wê, wek filaşbakê di ber çavê min re derbas dibin.. Mirovên wê bi xurtî li dergehê hiş û xeyala min didin, doza mafê xwe dikin ku ez wan bibîr bînim; Qidûr Begê Milî bi kumê xwe yê sor û bi rêşî, Hesenê Haco bi kum û kolozê Hevêrkî, Dr. Ehmed Nafiz Zaza bi bijîşkiya xwe a çelengî, Cegerxwîn bi helbesta xwe Kîme Ez, Namî bi helbesta xwe Pêşkevin Em Serfirazin, Karabêtê Xaço bi strana Lawikê Metînî, Aramê Dêkran bi Zimanê Kurdî Şêrîn û Xweş E, Mihemed Şêxo bi strana Ez Bûme Pîrê Xemcivîn û Seîd Yûsiv bi strana Qamişlo Bajarê Evînê.. 2

69 SAL... Dûmahîk

hezaran keç û xortên Kurd ên welatparêz û dilgerm li Efrîn, Kobaniyê, Cizîrê, Heleb û Şamê, Partiya xwe hembêz kirin û bê dudilî ew tevlî rêzên wê bûne.

Di demeke kurt de, rêxistina nûhatî li deverên Kurdî li Sûriyê geş bûye, û dest bi belavkirina ramana netewî kiriye, rê li pêş guhdana Ziman û Çanda Kurdî dûz kiriye, evîna Kurdîtî û welatparêziyê di dilê miletê Kurd li Sûriyê de gur û bilind kiriye. Ji ber vê hindê jî, berpirsên qafteng û har ên desthilatê, bi armanca çavtirsandina gelê Kurd da ku her dîl û jar bimîne, dest bi girtina serkirdayetiya Partiyê kirin, û ew di girtîgehên Heleb û Mezê de zîndan kirin, û her kesên ku dîroka vê tevgerê şopandibe, vê rastiyê dizane.

Di vê bîranîna pîroz de, em naxwazin hûrgiliyên dîroka vê tevgerê bixepêrin, yan tenê em kêmasî û şaşiyên wê berçav bikin û raxînin, û xalên erênî bincil bikin, veşêrin, tenê em xalên reş berçav bikin û gunehên rêvebirên wê giran bikin. Herwiha, nabe ku em hemû partiyên Kurdî, çi yên berî 2011-an û çi yên piştî wê hatine çêkirin bi yek gunehî tewanbar bikin. Pêwist e, di nirxandina xwe de em dadmend bin, xwedî guneh û şaşiyên giran binav bikin, gunehê wî destnîşan bikin.

Lê, reşkirina dîroka tevgera Kurdî - digel hemû kêmasiyên wê - rajeya doza Kurdî li Sûriyê nake! Çimko doza me ye dadmend, bê hebûna tevgereke siyasî xwedî rol û bandor, serkeftinê nabîne. Ji ber vê hindê ye, neyarên doza me hay ji vê yekê hene, dixebitin ku her vê tevgerê rûreş û riswa bikin, dîwaran di navbera wê û gel de ava bikin, wê ji xwediyên wê dûr bikin. Lê, ev nayê wê wateyê ku rexne li partiyên vê tevgerê nebin, çimko, rexne, ji bo rastkirina siyaseta tevgerê, şêwe û alava herî giring û kêrhatî ye.

Ji keç û lawên me tê xwestin îro ji diho bêtir ku careke din ew xwe li dora tevgera xwe ya siyasî bidin hev, wê ji kêmasî û şaşiyan bişon, armancên pîroz biparêzin û dost û neyaran ji hev cuda bikin, û bila em hemû zanibin ku partiyên me, ji bo dozeke mezin, a ku navê wê doza gelê Kurd e, hatine damezrandin, ne partiyên kesan e, digel rêz û rûmetê ji hemû xebatkarên dilsoz re. Ango, bi kurtî mirov dikare bibêje, di naveroka xwe de, doza gelê Kurd ji hemû kesan mestir e.

Li dawiyê, dilsozî ji hemû pakrewan û pêşengên vê tevgerê re ew e ku Partiyên me yên sereke kongireke fireh lidar xin, hemû aliyên siyasî lê beşdar bin û lêvegereke Kurdî Sûrî ava bikin, da ku ew lêveger, nûnertiya gelê Kurd li Sûriyê bike, xwedî biryar be û berevaniyê di ber mafên wî yên rewa di aştî, azadî û wekheviyê de bike.

100 Saliya... Dûmahîk

Û Wiha ew filaşbak, min bi dûv xwe de dikişkişîne.

Erê.. Qamişlo ev bajarê ku hin jê re dibêjin Kalîforiniya Rojhilatê, hin dibêjin Parîsa Biçûk û hin dibêjin Bûka Cizîrê, di 20ê Tebaxa sala 1926an de, ji aliyê Fransîzan ve hatiy avakirin. Di destpêkê de, Cihûyên Nisêbînê, Siryaniyên Bagokê, Ermenên ku ji ber tirkan revyayî bûn û Kurd û Erebên derdorê bi avakirina Qamişlo re westiyane û xwe li dor xanîkê Qidûr Beg, sera û qijleya fransîzan û peravên çemê Ceqceq girtin, xanûman avakirin û bi demê re Qamişlo di binya bajarê Nisêbînê de ji çend taxan hat avakirin wek: taxa, Siryan, Ermen, Aşûriyê, Cihûyan, Tey û Elî Fero (Xerbî) di gel gundê Hilêliyê ji baxerb ve û Enteriyê ji bareş ve.

Roja îro, ji cihên navdar di Qamişlo de: Gora seydayê Cegerxwîn, Mihemed Şêxo, Seîd Yusiv û goristana welatparêzên Kurdan li gundê Dugirê ku ev qehreman tê de hatine veşartin: Hemze Begê Miksî yê ku kovara Jîn di sala 1918an de li Stenbolê diweşand, Hacî Mûsa Begê Xwêtî, Dr. Nafiz Beg Zaza, Dr. Qasim Cemîl Paşa, Arif beg Abbas û kurê wî Dr. Dara, Silêmanê Ebês, Haco Axa û kurên xwe, Ebdulrehman Axa yê Eliyê Ûnis..hwd. Hem jî gora Osman Sebrî li gundê Berkevirê ye, nêzîkî bajarê Derbêsiyê û gora Îbrahîm paşayê Milî li gundê Sifeya ye, di navbera Qamişlo û Hesekê de.

Ta berî çend salan, hin partiyên Kurdan çend kovar û rojname bi zimanê Kurdî li Qamişlo diweşandin, wek kovara Gelawêj, Pirs, Jîn, Gulîstan, Stêr, Xunav. Gurzek Gul û rojnameya Newroz. Mixabin tev hatine rawestandin, tenê rojnameya Newroz di weşana xwe de berdewam e.

Gotina Qamîşlê an Qamişlo, gotinek Kurdî ye orjînal e. Ne Tirkî ye wek ku hin dibêjin, dibe ku Tirkan ji me dizî be wek gelek gotinên din.. Qamîş, Qamir, Zil, Çît, li ber ava çemê Ceqceq şîn dibûn. Nexasim ku Qamîş bi pirbûn şîn dihat, ji ber vê yekê navê Qamîşlê an Qamîşlokê li bajar hatiye kirin. Roja îro, Qamişlo ji bajarên herî bi hejmara bijîşk, avokat û endezyarên xwe pir tê naskirin. Sed mixabin piştî 2011an, nema ew Qamişloka berê ye. Mixabin ku di gelek waran de hatiye guvaştin.

Qamişlo 24/6/2026

Biryara tevgera Kurdî sûriyê li ba kê ye?

Zanistê cûmê



Tevgera Kurdî li sûriyê, ji kevin de, di pir asteng û delavan re derbas bûye û hîn jî berdewam e. Ji destpêka demezirandina partiya yekemîn ve li sûryê ta salên 80yî, tevgera Kurdî di navbera çep û rast de dihate dabeşkirin. Piraniyê wan, hevdu tewanbar dikirin, ku filan partî ji yê din pirtir bi ser riya sosyalîst û markisiyê de ye ji yên din pirtir yan kêmitir e. Piştî derbasbûna P k k û avakirina partiya PYD li sûriyê, hîdî hêdî heyameke nû hate meydanê. Berjewendiya hin partiyan bi PYD ve û hinan bi ENKS ve hate girêdan, û hinan jî xwestin ku xwe bi xweseriyê bidin naskirin, ku kanibin kesayetiya siyasî ya Kurdî sûrî bête naskirin, lê mixabin, bi zelalî tevgera Kurdî sûrî serûber wek dûvçilik hatibû naskirin.

Bi teybat ev partiyên serbixwe bêtir di salên 90an de, piştî yekbûna sê partiyan û avakirina partiya (Yekîtî), hat naskirin, bû ciyê balkêşiyê û camawerekî berfereh ji nivîskar, rewşenbîr, xwendekar û xwedî bawernameyên bilind, cîh di nav de girtin, û digel rêzgirtinê ji hemû birayan re, ew bawerbûn ku divê biryara tevgera Kurdî sûrî li Qamişlo, Efrîn û Kobaniyê be , ne li Amed, Erbîl, û Mihabadê be.

Partiya Yekîtî, wek hatî naskirin, xwedî helwesta ku biryara tevgera Kurdî li sûriyê divê di destên wê de be, ji ber wê yekê, belkî win tev dizanin avakirina Encûmena Kurdî di riya duhok 1-2 û Erbîl rola partiya Yekîtî ciyê balkêşiyê bû, lê mixabin, dîsa bi ser neket. Rola dewleta Turkiyê di hilweşîna encûmenê de xuya û zelal bû, bi birayarek ne zelal û durist bê lêkolîn partiya Yekîtî ji encûmenê hat bidûrxistin.

Baweriya min, ta rojên îro, li cî ye ku partiya Yekîtî dixwaze serxwebûna biryara siyasî Kurdî were parastin, ew biryar rast e û divê berdewam be. Lê mixabin ji salên 90an de ta rojên îro, me nikaribû ev siyaseta dadmend û rast, fereh bikira yan hevbendiyek ji çend partiyan ava bikira, ku ev xeta siyemîn wek tê binavkirin nemirê û ji nûve şiqin bide.

Piştî evqas sal, mirov digihe bawerîkê ku ev heyam û guhartinên di rojhelata navîn de peyda bûne, divê em jî wek partî piştî şêwir û danûstandinek fereh li xwe vegerin. Ji xwe û hevalên xwe bipirsin derd û derman çi ye?

1 -Lêvegerek rexneyî bi berpirsiyarî.

2 -Dem dema komcivînên gelêrî, şêweyê siyasî ye, ne yê tekan e û ezeziyê ye.

3 -Divê zelalî di armanc, siyaset, û têkilî bi tevgera Kurdistanî re hebe.

4 -komît û dezgehên partî bên nûjenkirin da ku em bighin rastiyê.

Ji ber van sedemên jorîn û hin din jî, ta roja îro, em di navbera pirojeya Berezanî û Ocelanî de, windayî mane. Ji salên 90an ta roja îro, derdora 30 salî borî ye, ta niha ev pirojeya yekrêziya tevgera Kurdî di bin siya serxwebûna biryara siyasî Kurdî de, bi ser neket, û ez di wê baweriyê de me ku heger wiha here, tu carî bi ser nakeve, ji ber ku berjewandiya çi mirov û çi jî yên partiyan be, di ser mafê gelê Kurd re tê girtin.

Vêca ji me tevan tê xwastin bi sîngegek fereh û mêjiyekî vekirî em li xwe vegerin, çima partiya me herdem bûye qurbana partî û tevgera Kurdî. Ji endamê perlementê sûriyê de, birêz Fuad Elîko de bigere, ta birêz Ehmed Silêman di konfirasa 26ê nîsanê de, em xwe dikin qurban ji bo ku doza xweseriyê biryara tevgera Kurdî sûrî bi serkeve. Lê mixabin, li dawiya dawî, em bi tek û tenê dimînin û em hîn berdewam in. Ez bawerim girêk û derdek heye, vêca derman çi ye?

Roja Zimanê Kurdî

Mislim Şêx Hesen

Di Roja Zimanê Kurdî de, mirov bi rastî matmayî dimîne ku ewqas kîn û nefret li dijî zimanê bêtirî 50 milyon Kurd tê kirin, û her roj hewildan tên kirin ku zimanê neteweya Kurd ji holê were rakirin. Ev yek eşkere dike ku nijadperestî û şovenîzm bi awayekî kîndar û nefretî li dijî gelê Kurd û zimanê wî dimeşin.

Lêbelê, ev siyasetên tundûtûj û bê sînor li dijî yek ji kevintirîn zimanên Rojhilata Navîn nikarin tu carî xizmeta gelên herêmê bikin. Ji ber vê yekê, pêwîst û girîng e ku dewletên ku Kurdistan parçe kirine û dagîr kirine, siyaseta xwe ya li dijî gelê Kurd û zimanê wî ji nû ve binirxînin, dev ji siyaseta kîn û tundiyê berdin, û rûpelekî nû di têkiliyên xwe de bi gelê Kurd re vekin. Herwiha, divê mafên neteweyî û zimanî yên Kurdan bi awayekî fermî û azad were naskirin, û mercên têkiliyên aram û baş bi gelê Kurd re bên avakirin.

..... 4

Ji Tarîtiyê çû Ronahiyê



Melek Murad

Di rojên dijwar û di nav serpêhatiyên giran de, jiyan li pêş çavên mirovan pir caran reş û tarî dibe. Mirov di nav xem û qisewetên giran de gêjo-mêjo dimîne, jiyan çember û çarçuva serê wî teng dike.

Lê pêwîst e ku mirov hêviyên xwe weha winda neke, ji ber ku hin caran, di nav bûyer û serpêhatiyên dijwar de jî, tiştên baş derdikevin holê, ango di zikê neyniyê de hin caran erênî heye.

Wek mînak, berî şerê Sûriyê li ba pir kesan hêvî û armanc hebûn ku keç û xortên xwe li Ewropayê bixwînin. Lê mixabin, ji ber şert û mercên dijwar, nemaze yên aborî, civakî û h.w.d, ne her kesî dikarî armanc û hêviyên weha bi hesanî pêk bîne.

Lê dema ku şerê têvel li sûriyê û li ser sûriyê dest pê kir, çi û çiqas sal direj kir, fişar û tengasiyên curbecur li ser gelê Sûriyê zêde bûn, gelek hemwelatî neçar diman ku welatê xwe bihêlin û berê xwe bidin Ewropayê da ku karibin zarokên xwe ji kuştin û birçîbûnê biparêzin.

Herwisan û ji ber vê yekê, ew li gelek welatên cîhanê pekiyan û belav bûn bi gelamper, û nemaze jî belengazên Kurdên me!

Lewre jî, vaye niha dibe zêdetirî deh salane ku gelek Kurd li Ewropayê cîwar bûne û hebûna xwe li wir wek keyseke lêhatî dibînin. Wisan jî, wan bi hesanî berê zarokên xwe dane dibistan, instût û zanîngehan, da ku ew mendal û zariyên rojnedîtî bixwînin û pêşve biçin. Ango hino hino li roja îro em dikarin bêjin ku bi sedan keç û xortên Kurd li zanîngeh û di fekûltên zanistî yên têvel de xwendin, bi dehan pisporên naskirî wek bijîşk, endezyar û .w.d bi holê ketin, hê jî keç û kurên me li vê biyanistanê li ser wê riyê berdewam in.

Bêgûman ev yeka ha ji bo me Kurdan şahnazî û serbilindî ye. Ji hêla dî ve, ev nîşana hişmendî, fedakarî û biryardariya dê û bavên wan keç û xortan e, ku wan karîbûn, di nav merc û hoyên zor dijwar de, xwedî li zaroyên xwe derkevin û berê wan bidana riya rast û durist.

Bi vê yekê, keda wan roj bi roj berdidan, berhem û hêviyan cîh digirtin, keç û xortên me bi serbilindî di hemû warên jiyanê de hêvî û armancên xwe bicîh dihanîn.

Wisa jî, ji hêla xwe ve, ew di nav dezigeh û saziyên fermî yên welatên Ewropayê de, cîhên balkêş digirtin. Ev jî ji bo doza gelê Kurd û pêşeroja wî, bêgûman sermiyanekî girîng e.

Her çiqas rêya ku me derbas kirî tijî zehmetî û fedakariyan bûye jî, encamên ku îro em dibînin û nîşan didin ku hêvî û bawerî tu carî bêberhem namînin. Xwendin û zanîn bingeha pêşeroja neteweyan e, û her serkeftineke keç an xortekî Kurd serkeftina hemû gelê Kurd e. Ji ber vê yekê, pêwîst e em herdem ji nifşên nûgiha re piştgir û alîkar bin da ku bi zanîn, hişmendî û serbilindî pêşerojeke ronahîtir ji bo xwe û gelê xwe ava bikin.

Bi rastî, em ji nav tarîtiyê derketin û ber bi ronahiyê ve birêve diçin. Hêvî heye ku ev ronahî roj bi roj mezintir bibe û nifşên nû bi zanîn, yekîtî û serkeftiyan, gelê xwe li her deverê bilind bikin

Erê û dîsan erê, ma gelo em li ku bûn û gihane ku?!

Roja Zimanê ... Dûmahîk

Di dirêjahiya van salan de, van dewletan ji siyaseta dijminahiyê li dijî gelê Kurd û zimanê wî tu sûd û qezencek rastîn nebiriye. Berevajî vê yekê, ev siyaset bûye sedema gelek pirsgirêkên siyasî, civakî û ewlehiyê, û herwiha bûye çavkaniya ne-aramî û windahiyên mezin di herêmê de.

Bi rastî, pirrengîya ziman û çandê di nav welatan de dewlemendî û hêzeke civakî ye, ne metirsî ye. Gava mirov dîroka welatên pirneteweyî û pirziman dixwîne, diyar dibe ku ew welat ji hêla çand, folklor û şaristaniyê ve gelek dewlemend in. Ji ber ku pirzimanî û pirçandî, di gelek civakan de, bûne bingehê pêşketinê, û geşkirina hevjiyanî û aramiya civakî.

Di vî warî de, gelek nimûneyên cîhanî hene ku pirzimanî wekî nirxek neteweyî tê qebûlkirin. Wekî Papua Gîneya Nû ku bêhtirî 840 zimanên fermî û herêmî tê de hene, Endonezya ku nêzîkî 710 zimanî tê de hene, Nîjerya ku bêtir ji 540 zimanî tê de hene, û Hindistan ku 461 zimanên zindî û hezaran zarava û şêweyên axaftinê di nav xwe de digire. Li Hindistanê, li gorî destûra welêt, 22 ziman wekî zimanên fermî tên naskirin. Hemû van ziman û çandan, ligel hev, di çarçoveya yekîtiya neteweyî de, bi awayekî aştiyane dijîn.

Herwiha, li gelek welatên din ên cîhanê jî pirrengî û pirzimanî wekî hêzeke neteweyî, çavkaniya dewlemendiya çandî û serişteyek ji bo pêşketina civakan têne dîtin.

Ji ber vê yekê, şert û berjewendiya herî baş ji bo van dewletên ku Kurdistan dagîr kirine ew e ku mafên gelê Kurd nas bikin û zimanê Kurdî wekî zimanekî fermî bipejirînin. Çimkî encamên siyaseta înkar, asîmîlasyon û dagîrkirinê, ji bo hemû aliyan, bûne sedema ziyanên mezin û demdirêj, herwiha rê li ber avakirina civakeke aştiyane û demokratîk girtine.

CIVATA YEKÎTIYA XORTÊN DEMOKRAT ÊN KURD LI SÛRIYÊ



Samî Mela Ehmedê Namî

Sala xwendinê ya 1953-1954an li Qamîşlo, hejmara xwendevanên Kurd yên dibistana navîn a fermî digihişt 20 xwendevanan, ez yek ji wan bûm. Hejmarek ji me hîn endamên Yekîtiya Ciwanên Cihanê bûn. Min hevaltiyek bi dilpaqijî bi tevan re çêkiribû, nemaze bi Ebdilezîzê Elîyê Evdê re, - em gundiyên hev û hevalên hev yên zaroktiyê û endametiya Yekîtiya Ciwanan bûn. Rojekê Ebdilezîz hevnasînek di navbera min û Derwêşê Mela Silêman û Mihemedê Mella Ehmed de çêkir - Mihemed mamostê dibistana seretayî li Qamişlo bû. Roj bi roj, hevaltiya me geştir û xurtir dibû û hêdî hêdî em bi raman, bîr û baweriyên xwe nêzîkî hevûdu dibûn, nemaze derbarî rewşa Kurd û Kurdistanê û rêxistinên siyasî yên welêt. Bi demê re rûniştinên me dibûn civîn û armancên me zelaltir dibûn, ta ko bûne biryara damezirandina rêxistineke Kurdî ye serbixwe, ji bona ko rastûrê têkevin xizmeta gelê xwe de. Ta wê demê baweriya Kurdan ew bû ku bi ti awayî wê nikaribin armanc û omîdên xwe bi cî bînin, eger ne di riya komunîstiyê de û bi alîkariya Sovyatan be. Komunîstan digot: Mafên miletê Kurd wê bên bidestxistin, gava dewletên dagîrkerên Kurdistanê bibin komunîst yan bibin welatên sosyalîst. Tevî van ramanên çewt jî ji wan dihat bawerkirin. Ta vê demê ger çiqas bawerî bi vê yekê dihat jî, lê ji wê bi şûnde ew bawerî hat şikestin û ji me re diyar bû ko ev rengê xebatê ji miletê Kurd re ne riya rizgariyê ye.

Hevalên komunîst doza endametiya partiyê li me dikirin, nemaze ewên ku endamên Yekîtiya Ciwanên Cihanê bûn. Lê min bi navê hevalan ji wan re dida xuyakirin ku eger rojekê em karekî siyasî bikin, emê wî karî di hundirê rêxistineke Kurdî de bikin.

Di 21. 04. 1954-an de, Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê, li bajarê Qamişlo hate damezirandin. Damezirênerên civatê ev bûn: Mihemedê Mela Ehmed, Samî Mela Ehmed Namî, Evdilezîz Elî Evdê û Derwêş Mela Silêman.

PARTIYA DEMOKRAT A KURD LI SÛRIYÊ

Ji Kurdên welatperwer Osman Sebrî, Hemîdê Hecî Derwêş û Hemze Niwêran biryara damezirandina partiyeke siyasî ji bo Kurdên Sûriyê dan. Nîzamnama partiyê bi zimanê Kurdî bi navê Rêzan û bi destê Osman Sebrî û bi alîkariya Doktor Nûredîn Zaza û Mam Celal Talabanî hat nivîsandin. Navê partiyê, Partiya Demokrat a Kurdistanê bû. Armancên giring yên partiyê rizgarkirin û yekitiya Kurdistanê bû.

Piştî danîna nîzamnama partiyê, di payiza sala 1958an de endamên komîta navendî ji van kesan pêk hat: Doktor Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Hemîdê Hecî Derwêş, Hemze Niwêran, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed, Şewket Henan, Şêx Mihemed Îsa û Cegerxwîn.

Di 14ê hezîrana sala 1957-an de, civîna pêşî ya komîteya navendî hat lidarxistin û ew roj wek roja damezirandina partiyê hat hesibandin.

Li vir dixwazim têkevim mijarekê û hinekî wê rave bikim, bê bi çi awayî Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd dibû beşek ji rêxistina partiyê.

DAWETA SAMÎYÊ NAMÎ

8ê Çiriya Paşîn ya sala 1958an, roja veguhastina hevjîna min Behiya Mela Mihemedê Beyandûrî bû. Dawetek pir xweş ji me re hate çêkirin. Xweşbûna wê bi dawetvaniyên wê bû yên weke Doktor Ehmed Nafiz, Arif Ebas, Doktor Nûredîn Zaza, Mam Celal Talebanî, Silêmanê Haco, Evdê Têlo, Hesen Hişyar, Seydayê Tîrêj, Mela Silêmanê Şehrikî, Ezîzê Zazî digel hejmarek ji welatper-weran û xort û keçên Kurd. Dawet bi reqsên rengîn û bi awazên kemança Mihemedê Kinê hat gerandin. Dawetvanî bi biçûk û mezinên xwe ve ketin dîlanê. Di nava şahiyê de, dawet rawestiya û şîraniya dawetê li dawetvanan hate gerandin.

Silêmanê Haco Axa, mêvanên me bi dawetvaniyan dan nasîn û di gotina xwe de, Namî û kurê wî Samî pîroz kirin û got:

Ev heval û birayê me Celal Talebanî ye, mêvanekî me yî ezîz e, ji Kurdistana Îraqê hatiye û bi me re beşdarî vê şahiyê bûye. Em dibêjin ser çavan tu hatî û bi navê we ez doza gotinekê lê dikim. Mam Celal di gotina xwe de Namî û kurê wî pîroz kirin û got:

Ez ne mêvan im, ez îro li mala xwe me, di nêv gel û hevalên xwe de me. Gava Kurdek ji parçekî Kurdistanê diçe parçekî din wek ku mirovek di mala xwe de, ji odekê têkeve odeke din.

Doktor Nûredîn Zaza jî peyivî û got:

Em bi vê hevdîtinê gelek kêfxweş in, sipas ji Namî re û pîroz be daweta kurê wî Samî. Ez ji xort û keçên Kurd dixwazim ko bixwînin û tevlî tevgera miletê xwe bibin. Xwendin e ya ko şopa azadiya gelan ronî dike û wan serfiraz dike, digel sipasiyan.

Stokholm 2026.06.24

Hevpeuvîn bi Zimanzan û nivîsakrê Kurd ê navdar Deham Ebdulfetah re



û Parastina zimanê Kurdî û Saziya Zimanê Kurdî SZK û yên yekîtiyên nivîskarên Kurd, ev sazî lihev rûdinin, lê gelek nakokî û ciyawaziyên rastnivîs û rêzimanê di navbera wan de hene.

Di pirtûka xwe ya dawî de ku bi navê (KOMEK ARÎŞE Û HÊVIYA ZIMANEKÎ YEKBÛYÎ), ez li ser van babetan rawestiya me.

P7 – Gotina te ji nifşê me yê nû re çi ye? Tu çi dixwazî ji wan re bêjî?

B7 - Ez ji wan re dibêjim ezmûna Se›îd Newresî ku tevaya pirtûk û nameyên wî bi zimanê Turkî û Erebî bûn, yek tenê bi zimanê Kurdî bû û radestî biraziyê xwe kiribû, tê de gotibû: nexweşiyên Kurda ev in: Xizanî, nezanî û nehevgirtin. derman jî ev e: xwendin , xwendin, xwendin, desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin.

P8 – Gotina te ya dawî ji xwendevanê weşana Newroz re çi ye?

B8 – Ez gelek şad û dilxweş im ku weşana Newroz hîn berdewam e û ez serkeftinê jê re hêvî dikim, di heman demê de dixwazim ji çi kesê ku Newroz dikeve destên wî ku bixwînin û tişta jê nizanibin bila bipirsin ji ber pirs kilîta zanînê ye. Û spas bo westana we bi min re.

Qamişlo 23.06.2026 Z

Mamoste Deham, tu bi xêr hatî mêvandariya rojnameya NEWROZ, hêvîdar in ku xwendevanên me, demeke xweş û sûdar bi we re derbas bikin.

Digel ku di ware nivîsandina bi zimanê Kurdî û zimanzaniyê de tu kesayetiyekî navdar î jî, em bi hêvî ne tu xwe bi xwendevanên NEWROZê bêtir bidî naskirin, destpêk çawa bû, kengî evîna zimên di dil û hişê te de pêket, bîranînên te bi mezinên me re yên tu rastî wan hatî mîna Osman Sebrî, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza…û hwd.

P1 - Xwezî tu xwe ji xwendevanên weşana NEWROZ re bidî naskirin.

B1 – Ez Deham E. Fetah im, kesekî gundî me min xwendina xwe ya seretayî li gund xwend û ta min Bekeloriya wergirt, û li zanîngeha Helebê min xwendina wêje û Zimanê Erebî bidest xist, min karê mamostetiya zimanê Erebî derdora 40 salî kiriye di dibistanan de.

P2 – Mamoste tu mamosteyê zimanê Erebî yî, te bi Erebî helbest û gotar nivisîne, gelo çima te berê xwe da nivîsandina bi zimanê Kurdî?

B2 – Tu dibistanên zimanê Kurdî li vir tune bûn, bo em xwe hîn bikin, li bajarê Amûdê semînarek li navenda Ciwanan hat pêşkêş kirin em jî vexewndî wê bûn, ew jî li ser helbesta Erebî di navbera kilasîk û nûjeniyê de, min jî pirsin ji wan kirin yekî ji wan gote min Mamoste tu mafê te nîn e ku tu bipirsê, ez gelekî engirîm û ev bûyer bû sedemek ku xwe ji çanda Erebî biguherim û berê pênûsa xwe jî bizivirênim zimanê Kurdî , û min nivîsên xwe yên Erebî şewitandin, ev jî sala 1987 bû , min deh salan xwe hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî kir û bi şûn de min dest bi nivîsa li ser zimanê Kurdî bi heman zimanî. Û ji wê demê ve min bi Erebî nema nivîsand.

P3 – Mamoste, rewşa zimanê Kurdî û asta ku gihayê de, tu çawa dinirxînî?

B3 – Eger em rewşa zimanê Kurdî, ku îro gihayê de, bi rewşa wî ya berê re bidin ber hev, em dikarin bibêjin îro em di buhara zimanê Kurdî de ne. Lê eger tu bipirsî gelo ev e armanca te, ez dê bibêjim NA!

Gerek nifşên me yên ciwan, guhdanê li zimanê xwe yê dayik bikin, lê vegerin û bi pêş de bidin, ji ber gelek çerx di ser me re derbas bûne, me guhdan bi rengekî zanistî li zimanê xwe nekiriye. Di vir de gerek em zimanê xwe bi zimanên miletên din re beramber bikin.

P4 - Perwerdeya bi zimanê dayik, çi bandorê li derûniya şagirtan dikê?

B4 - Zarok li ser sînga dayika xwe gotinên zimanê xwe dibihîze û di derûniya wî de têne tomarkirin, lê dema diçe dibistanê û zimanekî din dibihîze, nakokiyeke gewre di dirûniya wî de payda dibe; Lê dema di dibistanê de bi zimanê xwe fêr dibe, ew ji wê nakokiya gewre azad dibe. Aniha şagirtên me di wê dema zêrîn de ne.

p5 – Gelo Çima Kurd li seranserî Kurdistanê nikarin zimanekî standerd bi yek alfebayê bo xwendin û nivîsandinê saz bikin?

B5- Sedemê sereke ji bo vê xalê ew e ku hîn desthelateke Kurdî yekgirtî nîn e, bo vê elfeba yan ya din bikar bîne. Di sala 1970 – 1971 de hweldanin ji bal Cegerxwîn ji zanîngeha Bexdê û Nûrî Elî Emîn ji Soran û yek ji Lûriyan û gotin em dê Ferhengeke yekgirtû amade bikin bo damezrandina zimanekî Kurdî yekgirtû be mîna Ereb, Faris û miletên din. Em ji vir û vir lihevbicivînin û ferhengeke hevbeş û li nav Kurdan belav bikin, piştî bihtir ji 3ê mehan Nûrî Elî Emîn got ev tuşt li ser nayê erêkirin, pirsgirêk ne li aliyê Kurdan e.

Di 2003 ta 2006 ez li çar konferansên di zanîngeha Amedê de hazirbûn û bi beşdariya Dr Izzedîn Mistefa Resûl bo em ferhengekê ji zaravayên sereke amade bikin ku bibe zimanê xwendin û nivîsandinê, ew jî nakokî tê de derketin û neçû serî. Ez giham wê baweriyê ku dewleta Kurdî nebe, em nikarin zimanekî Kurdî yekbûyî amade bikin.

P6 – Hûn rola saziyên zimanê Kurdî li Sûriyê çawa dinirxînin?

B6 – Weke diyarde gelekî baş e, weke Saziya Fêrkirin

Êzdayetî: Rewş û Jiyan



Dilovanê Deştê

Ev gotar li ser daxwaza mamoste Nesîm Şemo, û bi alîkariya wî, hate amadekirin. Piraniyaa têgeh û zanyariyên derbas dibin ji danehava wî ne. Hêjayî gotin ye ku ev beşek ji gotareke berferehtir e; di hejmareke din de jî, beşê hejmara gund, bajar û bajarokên Rojavayê Kurdistanê yên ku nişteciyên wan tev Êzdî bûn, yan jî Êzdî beşek ji wan bûn, dê bête weşandin. Niha jî em li gotara xwe vegerin.

Çand yek ji berztirîn şêweyên peywendiyê di navbera civak û miletan de, û asêtirîn bingeha girêdana civakan bi hev re ye; ev jî sedema sereke ye ji bo pêşxistina peywendiyên civakî di navbera miletan de. Parastina çand û kevineşopan xweparastina civakan bi xwe ye; windakirina wan jî jihevketina civakê ye. Çand girîngtirîn hêmana parastina miletan û welatan e; herwisa, çand li gel miletên pêşketî û jîwer, pir balkêş e.

Êzdiyatî, yek ji pêkhateyên ayînî yên Mezopotamiyayê bû, û ta îro roj jî, di avakirin û pêşvebirina herêmê de, ew xwedî roleke balkêş e. Ev rastiyeke din e olî destnîşan dikê ku Êzdiyatî, digel pir tiştên hevbeş bi olên din re, xwedî çand û hin rê-û-resmên taybet e ku ne tenê wê ji olên din cuda dikin, lêbelê wê weke oleke ciyawaz jî destnîşan dikin.

Dema merov li dîrok û xaknîgariya hebûna Êzdiyatiyê vekole, yekser Rojava tê ber çavan. Tevî ku ew yek ji pêkhateyên ayînî yên sereke ye jî, lê zor, stem û tepeserkirina hem ji hêla rêjîmê ve, hem jî ji hêla hin aliyên civakê ve, derbarê vê olê têne ber çavan. Hêjayî zelalkirinê ye ku hewldanên rêjîmê ji bo windakirina vê ola pîroz û lêborînxwaz ta îro roj jî berdewam in. Lêbelê, piştî sala 2011ê, ev rewş li Rojava hate guhertin û dijwarî û zehmetkêşî ji holê rabûne. Vê yekê ne tenê hêviyên civaka Êzdî xurt kirin, lêbelê bikaranîna rê-û-resmên olî jî bi şêweyekî serbest û aram bi rê ve diçe. Ango, qonaxeke nû di pêvajoya peydakirina derfetan li pêşiya Êzdiyan, weku peyrewên hemî olên din, vebû da ku karibin bi hêsanî, bi erkên xwe yên civakî û ayînî rabin. Yek ji encamên vê jî ew bû ku Êzdiyatî oleke hevgirîxwaz, hevjiyanîxwaz û lêborînxwaz e.



Rewş û jiyana Êzdiyan li Rojava di /2/ qonaxan re derbas dibe:

1- Berî sala 2011ê:

Ev qonax li jor baş hatiye şirovekirin, û wê bêhtir, li pêş, bête zelalkirin.

2- Piştî sala 2011ê:

Ji Bihara sala 2011ê ve, Sûriyê di qeyraneke dijwar re derbas dibê, û ziyan gihande hemî pêkhateyan; lê, mezintirîn ziyan û dijwartirîn wêrankirin bi ser miletê Kurd de barîn. Para miletê Kurd dagîrkirin, Kuştin, revandin, talankirin, koçberkirin, windakirin û diziya şûnwaran, û guhertinên demografî bû. Êzdî, weke beşekî sereke ji pêkhateyên herêmên dagîrkirî, bêhtir ji yên din bûne armanca stem û zordariyê ji hêla komên tundrew û terorîst ve. Bêhtirê gundên wan hatin valakirin û goristanên wan hatin wêrankirin. Ev kiryarên tund û dijwar bûne sedema koçberbûna tevaya Êzîdiyan ji herêmên Efrînê û Serê Kaniyê, û piraniya Êzdiyên gundên Amûdê, Hesekê û Derbêsiyê.

Efrîn:

Piştî dagîrkirina Efrînê ji hêla komên tundrew û çekdarên terorîst ve, hemî pêkhateyên wê ketin bin zor û stema dagîrkeran, nexasim peyrewên ola Êzdiyatî.

Êlên Êzdiyan li herêma Efrînê derdora (12) êlan in; ew jî ev in:

Qelenderan, Şkakî, Reşikan, Dinan, reşî, Gulşar, Heskî, Şemokeran, Hemsoran, Bêrem, Reşwanî, Kesî....

Serê Kaniyê:

Duyemîn bajarê Rojavayê Kurdistanê ku, tevî gelek gundên xwe ketin bin benê dagîrkeriyê ye. Loma jî ev gund tev ji Êzdiyan vala bûne.

Hesekê:

Êzdî li 25 gundan ji gundewarê bajarê Hesekê hebûn; lê, mixabin, ew li hin ji van gundan nemane, û li hinan jî hejmara malbatên Êzdî kêm bûye. Ev kêmbûna Êzdiyan yek ji encamên rewşa zor û dijwar e ku tê re derbas dibûn.

Dirbêsiyê: .....

8

Êzîdayetî... Dûmahîk

Êzdî li 3 gundan tenê ji gundewarê Dirbêsiyê hebûn,

Tirbespî (Ceriha Cizîra Rojava):

Herêma Tirbespiyê dikeve Bakur û Rojhilatê Cizîra Rojava, hem jî yê Sûriyê. Pêdivî ye bête destnîşankirin ku berî bêhtir ji 100 salî /4/ çar gund li vê herêmê hebûn, ew ne tenê vala bûne, lêbelê şûnwarên wan jî ne xuya ne. Li herêma Cerihê 11 gund hebûn ku Êzdî lê dijîn.

Hêjayî zanînê ye ku ‹eşîrên Êzdî li herêma Tirbespiyê û Cerihê 14 in; ew jî ev in:

Dasikan, Nemirdanî, Kevnasî, Kîwexî, B›acolan (Be'ecolan), Behminmî, Mihokan, Şifqetan, Bacinan, Taqan, Zînan, Dinwan Efşî û Xaltan.

Edet, asa û folklor:

Çand, folklor û edetên Êzdiyan û pêkhateyên olî yên din li herêmên Rojava, digel hebûna hin cudahiyan jî, pir nêzîkî hev in. Ev cudahî jî di van ‹urf û a›adetên jêr de bûn:

1- Cil û bergên Êzdiyan li hemî herêmên Kurdî ne weke hev bûn. Piraniya mêrên Êzdî di hin qonaxan de, kirasên dirêj û pêsîrqewartî û çakêt li bejina xwe dikirin, û simbêl (simêl) qet kurt nedikirin. Lê, îro roj, çakêt, gumlek û şelwalên bajarî li xwe dikin. Jinan jî kiras û xiftanên dirêj û spî û pêşmal li bejina xwe dikirin û pornuximandî bûn. Li Efrînê, şewlêrên (şelwal) fereh yan jî kiras û hevalkiras ji cawê spî li xwe dikirin. Beşekî ji jinan kofî yan hemewî bi serê xwe de berdidan.

2- Di guhestina bûkan de, bûk ji mala bavê dibirine mala kesayetiyeke olî ji bo wergirtina pîrozdariyê ji (Xelat) ê. Pêşîmam, yan yek ji pîrozdaran, bûk û zava li hev mehir dikirin, û bi beşdariya bavên mehrê yên bûkê û zavê weku şahid.

3- Meha Nîsanê û rojên Çarşeman deminên pîroz in, loma jî şûkirin di van deman de nabe.

4- Di rewşên mirinê de, dema şîniyê rojên fer e (3, 5,...).

5- Mirî piştî rojava bi axê nayê spartin.

6- Di her sê rojên piştî şîniyê de û berî rojhilat, kesûkarên mirî seredana gorê dikin.

7- Di rojên dana xêrê di hemî rojên şîniyê de, eger kesek tenê miribe, divê hejmara sewalên têne gurandin fer be.

Tawis (Sinceq):

Tawis yek ji hêmayên pîroz yên ola Êzdayî ye. /7/ Tawis hebûn, û her yek ji bo herêmekê bû:

1- Tawisa 'Enzelê 2- Tawisa Şingal 3- Tawisa Hekarê û Zozanan 4- Tawisa Welatê Xaltan 5- Tawisa Helebê 6- Tawisa Tewrîzê 7- Tawisa Serhedê, Mesqûfa û Dina.

Cejinên Êzdiyan:

1- Sersala Êzdiyan (Nûjenbûna Çerxa Jiyanê):

Cejina Sersalê dikeve Çarşema pêşîn ji meha Nîsanê li gor salnameya Rojhilatî. Ev cejin kevintirîn cejin e di bîr û baweriyên Êzdayetiyê de çimkî ew bîranîna roja afirandina gerdûnê ye ku Yezdanê Pak û Gewre giyan berda laşê Adem. Ev roj weke (Hêkesor) jî tê binavkirin.

2- Cejina Êzî:

Cejina Êzî, yan jî (Cejina Rojiyê), di Êzdayetiyê de girîngtirîn û pîroztirîn cejin e. Ew piştî sê rojên rojiyê di kintirîn rojên salê de ye. Ev cejin û rojiya berî wê, nîşana dijayetiya di navbera ronî û tariyê de ye. Divê herî kêm, rojek ji rojiyê, yan jî roja cejnê bikeve yekê meha Ber Çile.

3- Batizmî:

Batizmî yek ji cejinên pir kevin û girîng e. Berê tevaya Êzdiyan şahî bi hatina vê cejinê dikirin; lê mixabin ku zor, tepeserkirin û komkujiyên derbarê civaka Êzdiyan bûne sedemên ku beşekî berfereh ji wan nema şahî bi vê cejinê lidar xistin. Batizmî seranserî /7/ rojan, ji Yekşemê ta Yekşema pey re, berdewam dikir, û di nav wan de jî, roja yekem ji sala nû.

4- Cejina Şêbilqasim (Xilmet):

Li gora salnameya Rojhilatî dikeve Îna pêşîn ji meha Gulanê. Xilmet dawiya Biharê û destpêka werza palehiyê destnîşan dike. Herwiha jî, nabe ku berî vê cijinê paleyî bibe. Dîroka vê cejinê vedigere hevdîtina di navbera Mûsa Pêxember û Şêbilqasim de. Li cem Dina, pîrozbahî di heman rojê de bi Cejina Boqetar dikin.

5- Cejina Xidilyas (Xidir İlyas):

Li gor salnameya Rojhilatî, bi boneya destpêka Biharê, di Pêşem û Îna pêşîn ji Reşemehê de, Êzdî vê cejinê lidar dixin. Ev cejin cihekî balkêş di ola Êzdiyatî de digire; ji ber pîrozî û giringiya wê, Êzdî hersê rojên berî wê bi xwe rojî digirin. Roja pêşîn rojiya Xidilyas e, ya didiwê rojiya Xidir Nebî ye û ya sisiyê ji bo hêvî û daxwazan ji Afirênerê Gerdûnê ye. Gurandin û nêçîr di van her pênc rojên pîroz de nabe. Herwiha jî, xwarina sereke ya di vê cejinê de (pêxwîn/ Poxwîn) e ku ji /7/ heft berê cot çêdibe.

6- Çilê Zistanî:

Di Çilê Zistanî de, Bavê Şêx, Meclisa Rûhanî, Şkestî û Çilegir /40/ çil roj rojî digirin, ew jî ji 11ê meha Berfanbarê ta 20ê meha Rêbendanê ne; cejin jî dikeve herdu rojên dawî de.

7- Çilê Havînî:

Di destpêka Çilê Havînê de, Bavê Şêx û Meclisa Rûhanî û pîrozdarên olî, û herkesê bixwazê, di rojên vî Çileyî de rojî digirin. Ew ji 11ê meha Pûşberê ta 20ê Tîrmehê, didomîne. Rojîgirên çile bi nasnavê (Çilegir) têne naskirin.

Min Di Xewnê De Zimanê Xwe Dît



Kalê maratê

Ez di xew de bûm. Min xewnek dît.

«Hey lo» dengek hat. Min li dora xwe mêze kir. Tu kes tune bû.

«Lo ma tu min dibihîsî?» Min dîsa li doraliya xwe nihêrî: lê dîsa tu kes tune bû.

Min got: «Erê ez te dibihîsim, lê te nabînim: Tu kî yî? Li ku têyî?

Got: Ez hem kesek im, hem jî her kes im. Ez hem tiştek im hem jî her tişt im. Ez zimanek im: Zimanê her tiştî me. Ez zimanek im. Zmanê te me. Zimanê te yê zikmakî me. Her çi di cihanê de, mirovên min bikartînin heye, di min de ye. Çi we mirovên ku afirandiye di min de bi min xuya ye»

Min jê pirsî: «Niha tu zimanî? Çawa û çi ziman e?

«Ez Kurdî me» bersiv da û got: «Zimanê gelê Kurd im, bîr û bawerî, hiş û hişmendî, mejî û raman, dîrok û kevneşopên Kurd im, jiyana Kurdan û Kurd bixwe me. Her tiştên Kurdan bixwe me. Her tiştên Kurdan di min û bi min bi ve ne.». Min pirs berdewam kir: «tu li ku yî?» Bersiv da û got: Ez di mêjiyê te de me, «çawa?» Min pirsî .

Wî got: «Ma tu nizanî çi yê te heye, di mejiyê te de. Ez di zindana mejiyê te de dîl girtî me.»

Min dîsa pirsî: «çawa?»

«Dema ku tu yekem car çûbûyî dibistanê» û gotinê berdewam kir: «te bi zimanê biyanî dest bi xwendinê kiribû «.

Min got : Erê

«Ew ziman giran bû, lê pirê caran bi zorê hînî te kiribûn. «Gotinê berdewam kir: «û mamosteyên zimanê biyanî, zimanê xwe hînî te dikirin. Di demê de zimanê te yê zikmakî yanî ez li te hatim qedexekirin û li ber çavên te hatim biçûkirin»

«Tê bîra min ...» Min got û berdewam kir:

Qey wî ez nebihîstim û vegotina xwe berdewam kir. «Di destpêka hatina wî zimanê biyanî de, di mêjiyê te de giran giran cih digirt û min jî ji wî re cih vedikir. Ez kêfxweş bûbûm ku zimanek li min cîran dibû, ji bo ku ez di mêjiyê te de bi tenê ziman bûm. Min dixwest ku pir hînî zimanê te bibin ku min dewlemend bike. Bi rastî jî yê dewlemend bikira. Di mejiyê te de cih fireh bû. Te dikarîbû bi dehan zimanan di mejiyê xwe de cih bikira tu hê zarok û ciwan bûyî.

Min pirsî: «Çi bû ?»

Lê min nexwest ku ez vegotina wî bibirim. Min pirsa xwe kurt birî û wî berdewam kir; lê ev ziman hat. Cih û warê min dagirand. Paşê ez girtim avêtim bin mejiyê te. Bin jî cihekî wisaye ku bi rastî mirov dikare vê bi zîndana mejî bi nav bike. Lê vê zîndanê, yanî di bin mejiyê te de tiştên ku ji mejiyê te, yên ku ji alî civatê û ji doraliyê te ve hatin qedexekirin hene. Tiştèn di vir de yên ku ji alî pergal û civatê ve hatine cezakirin hene.

«Min hinek bi qîrîn û meraq» çarx bibe û bizivire ser xwe. Paşê li te çi bû? Tu vê bêje. Te çi kir? Min çi kir ?»

Min vegotina wî ya li ser wî, yanî serboriya wî meraq dikir. «Gav bi gav te ez anîm bîra xwe» got. Lê di demê de te ez ji bîr kirim, bi salane ez di vê zîndan û bîra reş û tarî de dijîm.

«Xewna min bû xofek û ser min de dihat;

«Niha tu min nasdikî ? Ez têm bîra te?»

Ew bi hemû hezên xwe bi ser min de dihêşt ku ez difetisîm û dilê min teng dibû.

Min got; «Erê, tu di bîra min de yî. Ez te nas dikim. Mîna duh di bîra min de yî, tu zimanê min ê yekemîn, zimanê minê zikmakî yî. Ji kesekî din ez fêrî te nebûm, ji dayika xwe, ji bavê xwe, di zikê dayika xwe de ez hînî te bûm. Dema ku min çav û guhên xwe li vê dinyayê vekirin, çavên min dayik û bavê min dîtin, guhê min dengên wan ên bi te xemilandî bihîstin,

«Min ji vê zîndanê bifiltîne. «gotin bi neçarî û berdewam kir:

«Ez ji te cihê xwe yê ji aliyê zimanê biyanî ve hate dagirandin dîsa dixwazim. Eger tu bi têkoşîn li ber xwe bide ez ji bo te amede me. Tu min di vê zîndanê de bihêlê û min nawazî ez dê ne zimanê xewna te bim, ez dê bibim zimanê xewnereşa te»

Min bi hêrs betanî ji ser xwe avêt û ez ji xewê rabûm. Êdî zimanê min ê zikmakî di xewna min de ye û ez dê xewnên xwe pê bibînim

Çîrok

«Sonda Li Kevrî Reşê»: Navbera Şoreşa Evînê û Barê Çînê

Ehmed Bilal



Beşê Yekem: Mêvanê Rojavabûnê û Kilîda Rabirdûyê (Dema Niha)

1.1: Nexşa Rojavabûnê û Mêvanperwerî (Hevdîtina Şiyar û Hoşeng)

Rojekê ez rûniştibûm, roj ber bi rojava ve diçû da ku şevek nû dest pê bike. Li wir, zarok li benda êvarê bûn ku kalik ji wan re çîrokên gelêrî yên exlaqî bibêje. Erê birano, ez li ber deriyê mala xwe rûniştibûm, li tenişta riya sereke ya ku devera Amîka bi riya gştî ya (Raco - Efrîn - Heleb) ve girêdida.

Ez li beriya çiyê bûm, li cihê ku dîmen wekî tabloyekê ku hunermendekî mezin ew xêz kiribû, rengên xwezayê di payîzê de tevlihev dibûn. Darên maziyan û zeytûnên çiyayî yên ku pelên wan ber bi zerbûnê ve diçûn, bi rengên din re tevlihev dibûn. Di nav wan daran de, dengê pîkê (amûrek muzîkê bayî ye ya gelê Kurd) belav dibû, şivanê gund melodiyên xemgîn lêdixist û pezên wî li dora wî diçêriya.

Ez wisa di nav xeyalan de bûm û li xweza û axê mêze dikir. Ji nişka ve, ciwanekî xweşik di rê de dihat, û roj li ber rojava bû. Destê xwe rakir û got: Silav li we be, bi dengekî ne asayî. Min silava wî vegerand: Silav bira, tu di vê derengiya şevê de li ku derê yî.

Wî got: Ez dixwazim herim Efrînê, bi zaravekî tevlihev di navbera Erebî û Kurdî de. Min jê re got: «Were qehweyekê vexwe,» û di dilê min de bû ku ewê wê şevê li cem me bimîne, ji ber ku êdî tu wesayît nemabûn.

Bi rastî, ew ciwan derbasî hewşa malê bû. Min gazî kir: «Şêro, kursiyekê ji bo mêvên wîne.» Diya min qehwe anî. Dema em axivîn, min jê pirsî: «Bira, diyar e tu li vê deverê xerîb î. Tu ji ku têyî û bi ku ve diçî? Wî axînek kişand û got: «Ax bira, erê, tu dikarî ji min re bibêjî xerîb û nêzîk. Ez Hoşeng im, ji Şamê me, lê bi eslê xwe ez ji gundê Kevrî Reşê me.

1.2: Rakirina Perdeyê Li Ser Sira Mîratî

Hoşeng (Çîroka xwe ji Şiyar re didomîne): Ev xwezayê ku dilan nêzî hev dike û çîrokên evînê çêdike ku cudahiyên civakî, dewlemend û xizan nas nakin. Bira Şiyar, nizanim çima ez ê çîroka xwe ji te re bibêjim. Mehek berê, dema min wesyeta bavê xwe li Şamê xwend, her tim min digot: çima tu xizmên min tune ne?»

«Piştî ku bavê min wefat kir û çiliya wî qediya, jina min Îva zerfek da min, ku bavê min - Xwedê jê razî be - wesiyet kiribû ku piştî mirina wî bide min. Min zerf girt û destên min dilerizîn. Min ew vekir û tiştên di hundir de derxistin: nasnameyek kevin û nameyek bi destxeta bavê min bû.

1.3: Wesiyet: Çîroka Şoreşgerekî bi Navê Mîrza

Nameya Bavê Mîrza kurt e: ``Kurê min Hoşeng, niha tu dikarî rastiyê bizanibî û malbata xwe nas bikî, ya ku rojekê ez jê reviyam. Ez ji gundê Kevrî Reşê me, ji Mala Axayê Hemreş im. Min ji Zeynebê hez kir, keça şivanê gund Hesen Şefan. Ez li dijî malbata xwe derketim, lê dema ez ne li wir bûm, kalikê te Zeyneb bi Mihemed ji Mala Hesen Mehik re zewicand. Piştî salekê, Zeyneb keça xwe Ayşe anî. Piştî ku Ayşe bû salek, di şevek heyvî de, min delala dilê xwe revand (dayika te). Ez ji koka xwe qut nebûme. Kurê min, ez ne sûcdar im, ez tenê şoreşgerê li dijî wan adetên kevnar û cudahiyên çînî me.»

Hoşeng: Dema min name xwend, min fêm kir ku wesiyeta bêdeng Ayşe ye. Xwişka min a ji dê, keça diya min Zeyneb, ya ku bavê min dema diya min revand, li dû xwe hişt. Ev bû wesiyet, ku ez vegerim û li Ayşeyê bigerim.

1.4: Veger û Rûbirûbûn (Şoka Derxistinê)

«Erê bira Şiyar, ez wê şevê li cem wan nemam. Dema ez gihaştim cewserê zeytûnê, min apê xwe Hesenê Hemreş dît, û min ew yekser bi rûyê wî yê mina rûyê bavê min nas kir. Min jê re got: Ez kurê Mîrza Hemreş im. Rûyê wî hate guhertin, ji kenînê veguherî hêrsê. Ew li hev civiyan û her kesî digot .....

11

Sonda li kevir... Dûmahîk

qey min karekî nebaş kir. Min ji wan re got: Hûn sedem in, apê min Hesen û kalikê min! Çima we ji bo bavê min negot? Apê Hesen got: ‹Bireve kurê min, niha tu vegere cihê ku tu jê hatî. Heger bavê Ayşeyê û xalên te bizanin, dibe ku te bikujin. Rabe, em te ji gund derxin û wisa, Şiyar, wan pêşwaziya min kir û ez ji gund revandim.

Beşê Duyem: Agirê Hesretê Di Mala Kevin De

2.1: Mala Kevin û Mêvanperwerî

Ez û Şiyar li hev rûniştî bûn heta ku roj ber bi rojava ve çû. Em çûn hundirê mala germ. Şiyar li ber derî, li ser kevirê Bêbelkê, yê ku ji bo mêvanê lezgîn bû, ji min re şîrove kir. Piştî şîvê, bavê Şiyar çîroka min bihîst.

Bavê Şiyar ê aqilmend: Erê, dê û bavê te bûne qurbanê wan adetên kevnar. Em ê çawa alîkariya te bikin û te bi malbata te re li hev bînin? Xwedê mezin e, kurê min, ezê rêyekê bibînim ku hûn li hev bên. Min got: Apê min, ez difikirim ku ezê li gund erdekî bikirim û malekê ava bikim, da ku ez li vir bi pismam û malbata xwe re bijîm.

2.2: Sûnda Xatirxwestinê û Rêwîtiya Vegerê bi Trênê

Hoşeng bi Şiyar re çû stasyona trênê ya Raco. Li stasyonê xatir ji Şiyar xwest, û Hoşeng li trênê siwar bû, ku ber bi Helebê ve diçû. Dema ku trên diçû, Hoşeng li rûyê erdê mêze dikir û di hişê xwe de bû. Wî zordariya apên xwe yên dewlemend û keremdariya malbata Şiyar a xizan berawird dikir. Wî soza bavê Şiyar, yê ku mîna Osman Sebrî dipeyivî, anî bîra xwe.

Gihîşt Şamê, li Rukn El-Dînê li derî xist.

2.3: Axaftina Hesretê û Biryara Vegerê

Zeyneb (dayik, bi hezkirin): Kurê min hezkirî! Çîroka xwe ji me re bêje.

Hoşeng ji dayika xwe re çîroka xwe got: Diya min, min nefret di çavên apên xwe de dît, lê min bavê xwe di şexsê apê xwe Hesen de dît. Wan ez ji gund derxistim.

Zeyneb, bi şerm: Tu çawa çûyî? Li ku derê mayî? Were ji min re bêje! Lê berî wê, divê tu ji min re bibêjî, te çawa bavê xwe cara yekem wekî evîndar dît? Hoşeng israr kir.

Zeyneb: Wekî tu dizanî, min ew li ber Qesitelê (Kaniya Avê) dît. Min satila xwe tijî dikir, û bavê te bi hespê xwe ve dihat. Çavên me li hev ketin, û ew ji bo min evîna yekem bû.

Hoşeng biryara xwe eşkere kir: Diya min, ez şeva borî li cem Şiyêr mam. Wî û bavê xwe şîret li min kirin, ku ez erdekî bikirim û vegerim. Apê Şiyar soza navbeynkariyê da. Diya min, bi îzna Xwedê, di Bihara îsal de, emê herin gund. Divê em erdekî bikirin û malekê ava bikin.»

Zeyneb: Erê kurê min, ez bi vê nûçeyê kêfxweş bûm. Divê tu amadekariyan bikî û pereyan ji bo avakirinê amade bikî.»

Beşê Sêyem: Bihar.. û Vegera Axayê Biçûk (Dawî û Çareserî)

3.1: Sê Mehên Benda û Navbeynkarî

Sê meh derbas bûn. Zivistan bi dawî hat û bavê Şiyêr bi bêdengî xebata xwe ya navbeynkariyê didomand. Baweriya wî bi Apên Mala Axayê Hemreş re çêbû: kurê wan ji bo kirîna axê, ne ji bo mîratê, tê li cem Xalên Mala Şefan, dil bû kilît. Wan çîroka xwişka xwe Zeyneb bihîst û pişta kurê wê Hoşeng girtin.

Di rojeke biharî germ de, têlefon li ajansa Mîrza Hemreş lêxist. Bang ji bavê Şiyar bû: Hoşeng, ax amade ye, û mêr li benda te ne. tu û diya xwe werin .

3.2: Kirîna Rûmetê û Lihevkirin

Hoşeng otomobîla xwe ya nû amade kir. Zeyneb, diya wî, jî bi wî re bû. Gihîştin mala Şiyêr. Bavê Şiyêr bi hêsiran û dilgermî Zeyneb hembêz kir.

Di roja din de, zilam li mala Şiyêr civiyan: Bavê Şiyar, Şiyar, Hoşeng, û apê wî Hesenê Hemreş, nûnerê malbata Axa ye.

Hesenê Hemreş bi dengekî cûda: Em li hev hatin, Hoşeng. Ax dê ya te be. Ev firotin ji bo bidawîkirina rabirdûyê ye.

Hoşeng perên li ser lihevkirinê bi neqd da, û kirîn bi pîrozbahiya amadebûyan temam bû.

3.3: Hevdîtina li Bin Dara Zeytûnê.

Hoşeng çû mala Xalên xwe, Mala Şefan. Xalê wî yê mezin bi hêsiran pêşwaziya wî kir.

Hoşeng: «Xalê min, xwişka min Ayşe li ku ye?

Xalê got: Kurê min, mêrê Ayşeyê çend sal berê mir. Ew niha li gundekî nêzîk dijî.

Hoşeng û Şiyar çûn gundê Ayşeyê. Wan Ayşe dît, li bin dareke zeytûnê ye kevnar rûniştî bû, strana Kurdî ya xemgîn digot. Hoşeng hêdî hêdî nêzîkî wê bû, û navê wê got: Ayşe?

Wê serê xwe rakir, û tiştên ku nas nedikirin dît, lê wê hestek kûr hîs kir.

Hoşeng çavên wî bi hêsir: Ez Hoşeng im, birayê te yê ji diya te Zeyneb im. Ez ji bo te vegeriyam.»

Ayşe rabû, û ket hembêza wî: Bira! Min dizanibû ku diya min ez ji bîr nekirime, min dizanibû.

3.4: Encama Çîrokê: Tu Malbat î

Hoşeng vedigere dema niha, li cem Şiyar rûniştî ye.

Erê birayê min Şiyar, wisa min karî kokên xwe bikirim, diya xwe vegerînim malbata wê, û xwişka xwe Ayşe bibînim. Çîroka min wekî wesiyetekê dest pê kir, lê wekî veger û rûmetekê qediya. Heger tu û bavê te nebûna, navê Mîrza Hemreş dê wekî rûreşiyekê maba, û kurê wî Hoşeng dê her û her xerîb maba. Ji ber vê yekê Şiyar, tu ne tenê heval î, lê tu malbat î.

Almanya

Parastina Jîngehê, Jîngeh çi ye?



Mustafa Hannan

Ji wê dever, herêm, çarçew û cihê ku zîndewar jiyana xwe ya rojane lê diqedînin re jîngeh tê gotin, ango cihê ku jiyan lê heye.

Jîngeh, ji pêkhateyên zindî (mirov, ajel, riwek, kurmûkêz,...) û nezindî (ax, av, ba,...) pêk tê.

Di nav van pêkhateyan de, têkilî û girêdaneke tund heye, ango pêkhateyek bêyî ya din nabe, darûber bê ax, ba û avê nabin, ajel bi piranî bê av, ba, ax nabin, ax bê av û ba, ajel nabe, mirov jî bêyî her tiştên ku li jor hatine nabe, ango mirov nikare bê av, ba, xwarin, ax, riwek, dar û beran bijî û jiyana xwe berdewam bike. Hemû tişt jî bêyî tav û ronahiya royê nabin.

Ji werzên salê yên herî baş, xweş û guncav bo ger û seyran û bêhinvedanê, werza Buharê ye. Buhar bi xemil û rewşa xwe, bi reng û ciwaniya xwe giyanê bi canê mirov, ajel, dar û beran de ber dide li Buharê her der dixemile û jiyaneke nû dest pê dike. Lewra di Buharê de, mirov di rojên bêhinvedanê de, di rojên karbestiyê de, tev malbat, an dost û hevalên xwe berê xwe didin nav xwezayê, ber çemekî, an kaniyekê an jî nav daristanekê, ji bo çend katan ji rojê bidizin û demine xweş dûrî qirecir û qerebalixa bajaran û alavên kar bihorîne.

Helbet, her yek ji me dema dixwaze derkeve nav xweza û sirûştê, dixwaze here cihekî hênik, xweşik, nav dîmenin nazik û cihekî bi bayê xwe paqij û hênik, li nav giya û kulîlkên rengareng û bêhinxweş, roja xwe ligel hevalên xwe biqedîne.

Lê mixabin! Pirî caran dema merov, an yek ji me diçe cihekî bala xwe dide ku cihekî ku yek lê rûne û bêhina xwe vede tune ye, derdor û cihê ku yek rûne, ji qirêj û gemarê tijî ye, lewma mirov neçar dibe an cihê xwe biguhêre, an jî wî cihî ji qirêj û gemarê paqij bike paşê rûne.

Gelo! Ma ev derên ku hêjayî seyran û bêhinvedanê ne, cihên kesekî taybet in, paqijhiştina wî cihî ji pîsbûn û qirêjê berpirsyariya kê ye? Ma ne hemû kes wan cih û deveran bi kar tînin, ma ne her kes lê rûdine û lê xwarin û vexwarina xwe dixwe û vedixwe?

Gelo! Çima em ji xwe re nakin kar, ku her yek ji me bi erkê xwe, derbarê paqijhiştina surûşt û jîngehê, ranabe û ji berî wî cihî li şûn xwe bihêle û vegere mala xwe, wan deran paqij nake, gemara xwe, bermahiyên xwarin û vexwarina xwe berhev nake, naxe tûrekî û navêje cihê çopê yê destnîşankirî?

Parastina jîngehê ji qirêj û pîsbûnê, ne erkê me yekî bi tenê ye, ew erkê min e, ya te ye, ya wî û wê ye, erkê me tevan e, bila yek ji me nebêje ma ezê bi tenê çi bikim, ezê bi tenê çawa jîngehê paqij bihêlim? Na tu ne bi tenê yî! Ez, tu, ew û em tev bi hev re, dema ku em her yek bi erkê xwe rabin û derdora xwe paqij bikin û paqij bihêlin, dê her der paqij bimînin, paqijkirin û parastina jîngehê ne tenê erkê destlat, karmendên destlatê û rêxistinên pispor e, lêbelê ew erkê hemû endamên civakê ye.

Eger her kes, mala, pêş mala xwe, kolana xwe, cihê ku lê rûdine dixwe û vedixwe, paqij bike, dê her der paqij bimînin û hemû pêkhateyên ser zemînê dê jiyaneke xweşik, ciwan û tendurist biborînin.

Na! Ji pîskirin û qirêjkirina jîngehê re.

Belê! Bo paqijhiştina jîngehê û parastina wê.

Osnabrück, 23.05.2026



